

Serhatîa Jinka Dehmenpîs

‘Îsa çû li peristgehê [cihê dadkirnê], u gelek cemawer li dur xu bû, u rînişt u ew fêr dikirin. U mamostayêt desturî u ferîsiya [rêberêt dînê] jinek bi dehmenpîsiê girtibî îna nik u li nîva wan rawestand u gutine wî, “Mamosta, ev jinike dibêr mêrkekî ra razî ya hafî ye girtin. U Musî di desturê da ferman ya li me kirî ev jinkê van kara dikin bi berde barankirî bêne kuştin. Tu çî dibêjî?”

Ev pîsiare jê kir da wî tengav bikin u hêcetekê peyda kin wî pê tawanbar bikin.

Belê wî xu çemand u bi tîbla xu li ser ‘erdî dinivîsî. Belê wan her pîsiar jê kire ve, vêca xu rast kir u gute wan, “Ew kesê dinav we da yê bê guneh bit, bila li berahîê berekî danitê.” Careka dî xu çemand u li ser ‘erdî dinivîsî.

Demê wan guh li vê axiftinê bî, êk li dîf êkî çûn u berahîya hemîya rihspî, u ‘Îsa bi tinê li wêrê ma, u jinik di cihê xu da ya rawestaî bî.

Xu rast kir u gute wê, “Jinê, kanê ne ew? Kes jî wan dad li ser te ne kir?” Bersiv da, “Ne xêr ez xudam.” Gute wê, “Ezê jî te dad nakim. Herre u guneha ne ke ve.”

- Mizgînîa Yuhennâ 8:1-10

Destur:



Çakî:

